Ger te tobe nekiribe û bi navgîniya Îsa Mesîh li gunehên te nehatibin bexşandin, tuyê jî di nava yên ku bêne darazkirinan de be. Îsa Mesîh, bona te jî bi Xwedayê Pîroz re li hevbîne, li ser darexaçê, bi jankêşiyê mir.

Zêde nesekine, hema li ber Wî çong deyne û bona gunehên te li te bibexşîne reca bike! Ew dê li te bibexşîne û tuyê gellekî dilşa bibe. Li pêy Wî here û qet veneqete!

Tu îroj dijî, hê nebûye sibê, îroj tobe bike!

Ji ber, tu kes nizane ku dê heta sibê bijî an nejî

Dema munasîb a vay, niha ye; roja xelasiyê a vay, niha ye!

Bona tobekirinê niha dem li cih e, bo wê yekê hema tobe bike!

Îsa Mesîh te dawet dike û wusa dibêje:

Ya hemûyên westiyayî û bargiran, werin ba min û ez ê rehetiyê bidim we! … û ez yê ku ji min re were tu carî naqewirînim.

Ger di derbarê baweriya Îsa Mesîh de pirsên we hebe, ji kerema xwe, ji me re binivîsînin! Em ê bi bersivdayina pirsên we kêfxweş bibin.

Navnîşana Me Ev e:
Hoffnung und Leben e. V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Kurdisch (Rettender Glaube)

BAWERIYA KU XELAS DIKE

Ji Kitêba Pîroz Ya Xwedayê Bilind:

Di destpêkê de Xwedê ezman û erdê afirandin.

Hêjahiyên Xwedê ên ku nayên dîtin – hêza Wî ya bêdawî û Xwedêbûna Wî – ji afirandina dinê ve bi kirinên Wî têne fam kirin, bi aşkerayî têne dîtin.

Di destpêkê de Gotin hebû. Gotin bi Xwedê re bû û Gotin bi xwe Xwedê bû.

Û Gotin bû beden û bi xêr û rasteqîniyê ve tijî, di nav me de jiya; me jî bilindahiya wî dîtin.

Yehya roja piştre dît ku Îsa ber wî ve tê, wisa got: A vay, Berxê Xwedê, yê ku gunehê dinê ji holê ve radike!

Min jî dît û bi gotina: 'Mesîhê Xwedê Ev e' şahidiyê kirim.

Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Mesîhê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe.

Ji ber ku berdêla gunehê mirin, lê belê diyariya Xwedê, di Xelaskerê me Îsa Mesîh de jiyana bêdawîn e.

Ji ber, kesê ku Xwedê wî şandiye, gotinên Xwedê dibêje.

Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Her kesê ku gotinên min bibihîze û bawerî bi yê ku min şandiye bîne, jiyana wî ya abadîn heye û nayê darazîkirin, lê belê ew ji mirinê derbasî jiyanê bûye.

Ez ne bona kesên rast, lê bona gunehkaran bangî tobê bikim hatim.

Lê belê ger em gunehên xwe mukir bên, bona ku gunehên me ji me re efû bike û me ji her xerabiyê ve paqij bike, Xwedê dilsoz û dadmend e.

Qet cihêtî nîne. Ji ber ku her kes guneh kir û ji bêyî bilindahiya Xwedê ma. Mirovan bi xelasiya ku di Îsa Mesîh de ye, bi qenciya Xwedê bê berdêl pak dibin. Xwedê Mesîh mîna qurbanek bi xwîna xwe gunehan dide bexşandin û bi baweriyê tête pejirandin pêşkêş kir. Bi vî awayî dadiya xwe nîşan da. Ji ber ku sebir kir û gunehên hê berê hatine kirin bêceza hiştin. Vêya, bona ku bi dad bimîne û yê ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh ve bîne pak bike, di dema nuha de dadiya xwe nîşan bide wisa kir.

Divê ez bona xelasbûnê çi bikim? Baweriyê bi Xelasker Îsa ve bîne, tu jî, maliyên te jî, hûn ê xelas bibin!

Nivîsa Pîroz dibêje çi? Birahîm baweriyê bi Xwedê anî û bi vî awayî pakbûyî hate hesibandin.

Xwedê, Mesîh'ê ku gunehnezan, bona me kir pêşkêşiya gunehê. Wisa ku em bi saya Mesîh bibin rastiya Xwedê.

Cezaya ku bona xweşiya me bû, ji Mesîh re hate dayîn.

Xwîna Îsa'yê Berxê Xwedê me ji her gunehî pakij dike.

Bona hûn bizanibin ku jiyana we ya abadîn heye, ji we re, ji yên ku bi navê Mesîhê Xwedê ve bawerî anîne re, van tiştan nivîsandim.

Yê ku baweriyê bi Mesîh bîne jiyana wî ya abadîn heye; lê belê yê ku ji Mesîh re îtaetê nake, ew jiyanê nabîne, lê belê xezeba Xwedê li ser wî dimîne.

Ya Hevalê Xoşewîst, kêmasiya te ya herî girîng … Xwelaskerê Bilind Îsa Mesîh e!

Tu bêriya aştî, hezkirin û şabûnê dikêşîne. Lê belê bextewariya rasteqîn nabîne. Mirin, şer û pevçûn û bêtariyên ku em her roj dibihîzin, dinê dixe toqînê. Mirov ji her tiştî gûmandar, her tim bi tirs dijî. Ma ka em dizanin dê hîn çi bê serê me? Dawiya vê dinê nêz e. Dê Xelaskerê dinê Îsa Mesîh, dîsa were û hemiyên ku bi Wî baweriyê anîne bibin jiyana abadîn (Bihuştê).

Hê deriyên dilovaniyê vekirîne. Lê di gellekî nêz de bona her kesê ku Îsa Mesîh red kirine, dê roja daraziyê were. Dê yên ku baweriyê bi Wî neanîne bona abadîn ezabê bikêşînin dê bêne daraz kirin. **Abadîn mehfbûn!**